

Piştî 7 Salan Dr. Delîlê Azad e

Dr. Arif Delîlê li zanîgehên Helep, Şam, Urdir û dewletên kendava Erebî karkiriye. Di sala 1986 an de, bi hin hevalên xwe re, şevbuhîrka sêşema aborî li dar dixê. Ji ber daxwaz û rastkirina rewşa welêt, ji kar tê avêtin. Bi cangorî di çalakên çandeyî yên ji bo azadiya mirov û rakirina zagonên awerte û bi taybetî, zagona El-twar de dixebitî. Lewr, di 9 ê Êlûna 2001 an de, Dr. A Delîlê ji hêla ewlekaya Sûriyê ve tê girtin. û di sala 2002 an de, bi (gurkirina protestoyên çekdar) 10 sal ceza lê tê birîn. Û derdora 7 salan di zîdanê de dimîne. Û piraniya rojên zîdanê di tekzîdanekê de diborîne. Ji ber rewşa wî ya tenduristî ya xerab, Dr.A.Delîlê bi biryareke lêborînê ji serokê Sûriyê ve tê berdan.

Azadî ji hemî girtên nêrîne yên di zîdanên Sûriyê de

Kuştina jinan

Li gorî rapora wezaretê mafên mirovan ya **Kurdistana başûr**, di nav şeş heyvan de, 63 jin hatine kuştin û 190 jin jî xwe şewitandine.

Hewlêr : 32 jin

hatine kuştin û 78 jin hatine şewtandin.

Sulêmaniyî : 15 jin hatine kuştin û 56 jin şewtandin.

Dihokê : 16 jin hatine kuştin û 56 jin hatine şewtandin.

Dardakirin Li Îran

Li gorî biryara UN ya di dawiya 2007 an de hatiye girtin, ji bo qedexekirina

bidardakirina mirovan, pir welatên cîhanî ew biryar pejirandin û li gor wê bryarê zagonên xwe guhartin. Lê mixabin hin welat jî, ew biryar nepejirandin û ji nav wan welatan Îran e. Li gor rapora dezgeha Amnesty Internasoyal ya mafên mirovan ku îsal, ta niha, li Iranê 187 kes hatine bidardakirin û di sala 2007 an de, 317 kes bûn. A. Internasyonal dibîne ku, bidardakirin jiyana mirovan bi dawî tîne, ew karekî hovane ye.

Ji Komîta Şevbuhêrkên Kurdî li Şamê re

Xwişk û birayên hêja...

Beşdarên birêz:

Bi bûneya 5 saliya Komîta we, **Komîta Şevbuhêrkên Kurdî li Şamê**, bi navê Kovara PIRSê, em we pîroz dikin, û hêviya berdewamî û serkeftinê ji karê we re dikin.

Hêvî û omîda me ew e ku em hemî bi hev re ji bo geşkirina zimanê kurdî di civakê de kar û xebatê bikin, evîna xwendin û nivîsandina bi zimanê dê, zimanê me yê kurdî belav bikin.

Careke din em we pîroz dikin, hêvîdar in ku xebata we ya ji bo zimanê Kurdî her pêşve here.

Kovara PIRSê
24.07.2008 Z-2620 K

